Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1301 | 24-Tebax-2025 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/ | rojnameyaronahi | @ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com | Rojnameya Ronahî | +963 984 370 218

# Her şûnwarek şopek ji dîroka mirovahiyê ye

**Aryan Hesen/Qamişlo**

**Rêveberiya Parastina Şûnwaran Şêxmûs Hemo da zanîn piştî 2011'an ku li Sûriyê alozî pêş ket, gelek şûnwarên girîng yên herêmê hatin talankirin, lê ji sala 2014'an de ku Rêveberiya Parastina Şûnwaran hat avakirin û heta niha, şûnwarên herêmê tên parastin.**

Şûnwar ew cihên dîrokî ne ku resenî û dewlemendiya gelan diyar dike, dema dagirker dixwaze gelekî tune bike destpêkê berê xwe dide cihên dîrokî û şûnwaran, ji bo ku reseniya wan gelan tune û winda bike. Herwiha bi taybet gelê Kurd gelek cihê wan yên dîrokî hene, di wan cihan de şûnwar û şopên kevnar hene ku resenî û dîroka gelê Kurd diyar dike, ji ber vê jî dewleta Tirk gelek cihên dîrokî yên Kurdan xerab kirine û şûnwarên wan cihan talan kirine.

Derbarê kar û xebatê Rêveberiya Parastina Şûnwaran, rêveberê wê Şêxmûs Hemo ji Rojnemeya me re axivî.

### 'Her civakek bi dîrok û şûnwarên xwe tê naskirin'

Şêxmûd destnîşan kir ku di destpêka kirîza Sûriyê de gelek şûnwarên herêmê hatin talankirin û û wiha got: "Her civakek bi dîrok û şûnwarên xwe tê naskirin, lê dagirkeran ji bo vê dîrokê tune bikin hertim hewl dan ku şûnwaran wêran û winda bikin. Di 2014'an de ji bo parastina şûnwaran rêveberên parastina şûnwaran hat avakirin û komîte hatin çêkirin, di heman demê de parêzvanên şûnwaran hatin erkdarkirin.

Li Kantona Cizîrê gelek girên kevnar û cihên şûnwar hene ku reseniya van herêman diyar dikin, hejmara wan zêdeyî hezar û 43'ê girî ye, weke girê Mozan, Til Bêder û Lêlîn. Lê piştî ketina Rêjîma Baas vedîtina cihê şûnwaran zêde bûn û niha hejmara wan gihiştiye 1100 girî."





Rêjîma Baas gelek perçeyên kevnar ji şûnwaran hatin dîtin, me hemû komkirin û bi riya vê yekê 8 hezar parçe hatin dîtin. Herwiha wêneyên mûzerîk hatin dîtin û hejmara wan 82 wêne bûn."

### 'Piştî ketina Rêjîma Baas gelek şûnwar hatin dîtin'

Hemû diyar kir ku ji bo parastina şûnwaran ew ê hertim kar û xebat bikin û wiha pê de çû: " Rejîma Baas ji bo windakirina hebûna gelan û bi taybet gelê Kurd di destpêkê de êrîş li ser dîrok û şûnwaran kir, ji bo wateya wan gelan a resen tune bike. Dagirker bi her awayî dixwaze vî gelî tune bike, bi rêbazê asîmîlasyon û qirkirinê bi armanca wendakirina dîrok, çand, talan û wêrankirina mîrateyên wî gelî. Lê piştî ketina

### 'Bi êrîşa dewleta tirk re gelek şûnwar hatin xerab kirin'

Rêveberiya parastina şûnwaran Şêxmûs Hemo axaftina xwe wiha qedand: "Berî dagirkirina Efrînê gelek şûnwar û cihên kevnar hebûn ku bedewî û kevnariya wê herêmê diyar dike, lê piştî êrîşa dewleta Tirk gelek cihên şûnwar bi balafiran hatin xerabkirin û yê din jî piştî dagirkirina Efrînê hatin talankirin û dizîn. Li hin herêmên dagirkirî şûnwar hene, weke Til Helef lê ji ber dagirkirina wan herêman ji aliyê dewleta Tirk ev hemû şûnwar û gir hatin xerabkirin û li şûna wan navendên leşkerî hatin avakirin."

## Gotina Dawî



### Sûrî tunderewan qebûl nake

Mihemed Seydi

Li Sûriyê, piştî serdema Baas bi dawî bû, çav hemî li ser Bakûr û Rojhilatê Sûriyê ne. Ew xwedî Rêveberî, Sazî, hêza ewlehiyê û çavkaniyên aborî ye. Li aliyê din, QSD cihê baweriyê ye li gel Durzî, Elewî, Xirstiyan û hemû kêmneteweyan. Ev jî zêdetir Tirkiyê û desthilta Colanî aciz dike. Piştî komkujiya li Siwêdayê bi destê komên tundrew, serokê wan Ebû Muhamed El-Colanî li koşka Şamê wekî ku xelîfeya vê serdemê be, komek alîgirên xwe li pêş xwe kom kirin û ji wan re behsa rewşa Sûriyê dikir. Di nava axaftinên xwe de Colanî anî ziman ku dema Tirkiya û DYA tiştekî bixwazin, ew ê sedî sed pêk were. Ev jî mukurhatinek bû ku ew bi daxwaza van aliyan tevdigerin û li gorî wan gavên ew davêjin. Angu li Beravê û li Siwêdayê bi agahdariya van aliyan komkujî pêk hatine. Dema em axaftinên nûnerê DYA Tom Barack jî bînin bîra xwe ku digot ne hêzên Colanî ne ev komkujî pêk anîne û daxuyaniyên dewleta Tirk ya digot çima qale van komkujiyan dikin û ji yên Esed re çav dihatin girtin, dibînin ku her alî di bin re ji bo berjiwendiyên xwe ne acizin ku Sûrî werin kuştin. DYA ku dixwaze parçebûnê di nava xelkê Sûriyê de çêbike da kontrol bike û Tirkiyê jî difikire dema komên Colanî hêza tirsê bi kar bînin, ew ê xelkê Sûriyê zûtir kedî û kontrol bikin.

Li aliyê din, projeya Rêveberiya Xweser jî heye ku dixwaze Sûriyeke pirreng a ku hemû pêkhate di nava wê de xwedî nûner û nêrîn bin ava bibe û ji bo wê hemû hewlên xwe dike. Ji lewra konferansa ku li Hesekê li darxist, him Şam û him jî Tirkiya aciz kir. Dîsa dema Colanî li wê koşka xwe diaxivî, wekî ku xelkê Sûriyê li Siwêdayê û Beravê nehatibin kuştin tevdigeriya. Wekî ku ew padîşahin û xelk divê bê ku bifikire li peyî wan biçe û serê xwe ji wan re deyîne, xwe dida raberkirin. Lê her kesî dît û bihîst ka Elewî û Durziyan çi got.

Herwiha ji berpirsên Rêveberiya Xweser Bedran Çiya Kurd jî ji dezgeheke bi navê Elmûbaşir re ragihand ku ew ji daxwazên xwe yên Sûriyeke nenavendî ku mafê hemû pêkhateyan diparêze nayên xwarê û ew li ser rêgezên xwe danûstandinê nakin. Dîsa Çiya Kurd anî ziman ku bi zextên Tirkiyê, desthilata demkî ya Şamê xwe ji danûstandinên li Parîsê xwe dûr xist, lê ji bo wan cihê danûstandinê ne girînge, ji ber daxwaz û tevgerên wan zelalin, lê yên li Şamê ne bi destê xwe ne. Dixwazim bibêjim êdî dem guheriye û kes nikare tiştekî veşêre. Lewma nêrîna herkesî li Hesekê di konferansê de xwe da der û yên dixwazin bi derewan vê kombûnê reş bikin, wê çarenûsa wan wekî ya Baas û DAIŞ'ê be. Sûrî islamîst û Tundrewa qebûl nake.

### Sudoku:Pirs 54

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | 1 | 4 | 9 | | | 6 | | |
| | 2 | 7 | 3 | | 5 | | | |
| | 3 | | | | 6 | | | |
| 2 | | 1 | | 5 | | | | 3 |
| | | 8 | | | | 2 | | |
| 3 | | | | 4 | | 7 | | 6 |
| | | | 8 | | | | 1 | |
| | | | 5 | | 1 | 9 | 7 | |
| | | 3 | | | 9 | 8 | 6 | |

### Sudoku: Bersiv 53

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 8 | 6 | 5 | 7 | 3 | 2 | 9 | 1 | 4 |
| 4 | 3 | 1 | 9 | 6 | 8 | 7 | 5 | 2 |
| 2 | 7 | 9 | 1 | 4 | 5 | 6 | 3 | 8 |
| 6 | 8 | 7 | 5 | 9 | 1 | 4 | 2 | 3 |
| 5 | 1 | 4 | 3 | 2 | 4 | 8 | 9 | 6 |
| 9 | 2 | 3 | 6 | 8 | 4 | 1 | 7 | 5 |
| 1 | 9 | 6 | 8 | 5 | 3 | 2 | 4 | 7 |
| 3 | 4 | 8 | 2 | 7 | 9 | 5 | 6 | 1 |
| 7 | 5 | 2 | 4 | 1 | 6 | 3 | 8 | 9 |

## FERHENGA BIWÊJAN

**Nav li guran e, xwarin li teyran e:**
- Bi heman wateyê.

**Pişka me li pîsan ket:**
- Bextreşiya me ye; em li pîsan rast hatin.

**Serê me serê xêrnediyan, ji qirşikan çûn zeregûniyan:**
- Bextê me reş e; em aramiyê nabînin; em xêrê ji xwe nabînin.

**Serê min serê xêrnediyan e:**
- Bextê min reş e, şansê min nîne; serê min her tim di şeq û deqê de ye.

**Şansê wî goza kor e:**
- Bextê wî reş e.

**Tiliya min bihingiv be û bixim devê xelkê wê bêjin tehl e:**
- Bextê min reş e.

LI SER TEDBÎRÊ

**Çi dibe çi nabe:**
- Dibe ku tiştek biqewime; her tişt mûmkin e; dibe ku lazim bibe.

**Da em bizanin ka em çend bira ne:**
- Da em hesabê xwe bizanin; da em xwe nas bikin; ji bo ku em li gorî wê xwe amade bikin.

**Dema tu çûyî mêvaniya gur seyê xwe jî bi xwe re bibe:**
- Dema mirov biçe cihekî bixeter divê haya mirov ji mirov hebe.

**Gur çermê xwe ji xwe nake:**
- Tişta ku mirov pê tê parastin ji xwe dûr nake.

**Ker iblîs e derman werîs e:**
- Eger xeterek hebe, divê tu jî tedbîrên xwe bigirî.

**Kûçik hestiyan dixwe hay ji qûna xwe dimîne:**
- Berî ku mirov tiştekî bike divê mirov hesabê pişt re jî bike.

**Kûçik hestiyan dixwe hizrê qûna xwe dike:**
- Bi heman wateyê.

**Lingek li pêş yek li paş bû:**
- Em bêtedbîr bûn; amadekariyên me tinebûn.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

## Gulîstan û Hêro; lehengên ku mohra xwe li rojnamegeriya jin xistine



Rojnamevan Gulîstan Tara û Hêro Behadîn ku 23'ê Tebaxa 2024'an li navçeya Seyîdsadiq a Silêmaniyê ji aliyê dewleta Tirk ve bi SÎHA'yê hatin şehîdxistin. Di salvegera yekemîn de rojnamevanên jin soza xwedîderketina li keda wan nû dikin.**R-2**

## Luqman Xelîl: Pakrewan Nûreddîn Sofî dîroka zêrîn bû

Rêhevalê têkoşînê û biraziyê fermandarê mezin Nûreddîn Sofî, Luqman Xelîl da xuyakirin ku şehîd Sofî bi hemû taybetmendiyê xwe bibû Kurdistanî û wiha got: "Heval Sofî ne tenê fermandarê şer bû, di heman demê de dîroka jiyanê bû."**R-6**



Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1301 | 24-Tebax-2025 | www.ronahi.net/ku/ | Nirx: 500 L.S

## Ji bo siberoja cîhanê pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk



Berdevka Yekîtiya Jinên Kurd li Almanyayê Kezban Doxan diyar kir ku ji 27'ê Sibatê heya niha ji aliyê Tevgera Azadiyê ve gelek gavên şênber di aliyê pratîkî de hatine avêtin, lê dewleta Tirk piştî bangê bi 7 mehan tenê komisyon ava kir û di pratîkê de gavên berbiçav navêje û got, "Divê ne tenê ziman lê pratîka Tirkiyê jî bibe aştî."**R-4**

## Ji çiraxên hunera kurdî



Adil Feqê ne tenê hunermendek an stranbêjeke ku hin stranên xweş dibêje, lê ew dibistaneke hunerî û çandî ye ku coş dide nifşên pêşerojê...**R-7**



**Pêvajo çawa dimeşe?**
Ahmet Aktaş R-4



**Keleşêr Be û Li Ser Çîmenê Xwe Biqîre!**
Idrîs Henan R-5

# FOZA YÛSIF: ARMANCA TIRKIYÊ TÊKBIRINA HEVGIRTINA GELAN E

Endama Konseya Hevserokatiya PYD'ê Foza Yûsif diyar kir ku dewleta Tirk bi armanca têkbirina aramiya herêmê, hevgirtina gelan û avakirina Sûriyeke navendî, bi rêya medya dijîtal şerekî taybet li ser gelên herêmê dide meşandin û wiha got: "Li hemberî planan, em ê hevgirtin û yekîtiya xwe biparêzin, aramî û aştiya civakî jî pêk bînin."**R-5**





## Ji destpêka salê ve 2248 qezayên tirafîkê li Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê rû dane

Ji destpêka sala 2025'an û heta niha, li herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê 2248 qezayên trafîkê rû dane. Rêveberê Tirafîkê yê Bakur û Rojhilatê Sûriyê Eymen Ibrahîm diyar kir ku sedema bingehîn ya qezayên tirafîkê nepêkanîna zagon û hişyariyên tirafîkê ne.**R-4**



# Gulîstan û Hêro; lehengên ku mohra xwe li rojnamegeriya jin xistine

Rojnamevan Gulîstan Tara û Hêro Behadîn ku 23'ê Tebaxa 2024'an li navçeya Seyîdsadiq a Silêmaniyê ji aliyê dewleta Tirk ve bi SÎHA'yê hatin şehîdxistin. Di salvegera yekemîn de rojnamevanên jin soza xwedîderketina li keda wan nû dikin.

**Esma Miştefa/Qamişlo**

Roja 23'yê Tebaxê 2024'an li nêzî navçeya Seyîdsadiq a Silêmaniyê wesayîta rojnamevanên çapemeniya azad ji aliyê balafira bê mirov a bi çek a dewleta Tirk ya dagirker ve hatibû bombebarankirin. Di encam êrişê de her du rojnamevanên jin Gulistan Tara û Hêro Behadîn şehîd bûn. Her wiha 6 rojnamevanên din jî birîndar bibûn.



Hedefgirtina rojnamevanên jin ji aliyê dewleta Tirk ve ne cara yekemîn ku di heman dîrokê de di 23'ê Tebaxa 2023'an de dewleta Tirk xebatkarên Jin Tv li Bakur û Rojhilatê Sûriyê hedefgirtin û di encamp de karmendek şehîd ket û birîndarî çêbûn. Her wiha ji destpêka Tevgera Azaiyê û heyanî niha pêşeng û xebatkarên Ragihandina Azad tên hedefgirtin û binçavkirin. Helbet ev di çarçoveya tepsandin û ne eşkerekirina kiryar, sûc û êrişên ku ji aliyê dagirkeriyê ve tên kirin de dibe. Bûyerên hedefgirtina rojnamevanan li çar aliyên Kurdistanê tê kirin. Ev yek jî di bin bêdengiyeke navdewletî, tevger û rêxistinên parastina mafê rojnamevanan de tê kirin.

Bi salvegera yekemîn a hedefgirtina her du pêşengên ragihandina jin Gulistan Tara û Hêro Behadî li Silêmaniyê de, heya vê kêliyê jî sûcdar bê hesab û ceza ne.

Tenê di vê derbarê de dosya Şehîdkirina Gulistan Tara û Hêro Behadîn radestî Nûnertiya YE'yê ya Iraqê hate kirin. Ji aliyê UNESCO (United Nations Educational, Scientific and Cultural Organization - Organîzasyonên Çandî, Zanistî û Perwerdeyê yên Neteweyên Yekbûyî) ve li lîsteya 'Rojnamevanên hatin qetilkirin' hatin bicihkirin.

**'Asta xebatê me a niha ji keda şehîd Gulistan e'**

Yek ji rojnamevanên ku bi şehîd Gulistan Tara re ma ye Endama Jin tv Zelal Çeto ye. Zelal di destpêkê de hemû şehîdên çapemeniya azad b bîr anîn û wiha ji rojnameya me re behsa rêheval Gulistan kir: "Bi boneya yekmîn salvegera şehadeta Gulîsat tara û Hîro behadîn em hemû şehîdên Çapemeniya Azad bibîrtînin şehîd Gulîstan kedek wê mezin di avakirina Jin tv de heye asta ku îro Jin tv gihaştiyê bi says keda wê ye.

Şehîd Gulistan ji bo xwe bighîna hemû jinan û bibe dengê wan, têkoşînk da meşandin û li her derê cihê xwe girt. Ji bo pêşxistina hevalê xwe li kêlek wan bû û bi wan re dibû alîkar. Helbet bi van gotinan mirov nikare şehîd Gulîstan pênase bike, em çi bînin ziman jî wê di xwedîderketina li keda wê de kêm bibe. Bê guman em dikarin vê yekê bi kar û xebatê xwe bibin layiq".

Zelalê wiha axaftina xwe berdewam kir: "Şehîd Gulistan jinek rû li ken û bi hêz bû ku xwedî moral bû. Şehîd Gulistan bi terzê jiyana xwe em perwede dikirin ku em jê bandor dibûn. Hewil dida ku me fêrî her tiştî di jiyanê de bike. Ji bilî kar û xebatên ragihandinê di Jin tv de Kedek mezin da. Di heman demê de li Başurê kurdistanê xwediyê kedek bi heybet e û bi têkoşîna xwe bû hêz ji hemû jinên di xebatê çapemeniyê de".

**'Armanc hedefgirtina pêşengên civakê ye'**

Zelalê da zanîn ku dagirkeriya Tirkiyê di hedefgirtina keseyeta şehîd Gulistan û Hêro de xwest jinên pêşeng hedef bigre û wiha pê de çû: "Ne cara yekê ye dewleta Tirk rojnemevanên jin hedef digre her wiha ne ya dawî bû jî, piştî hedefgirtina şehîd Gulistan û Hêro gelek Rojnemevan hatin hedfgrtin. Dewleta Tirk bi rêya hedefgirtina rojnemevanan bi taybt jî rojnevevanên ku bûne dengê civaka xwe yên ku li dijî hêzên desthlatdar têkoşîn dikin, dixwaze dengê rastiyê tune bike. Di kesayeta şehîd Gulistan û Hêro de armanca Dewleta Tirk ew bû ku jinên pêşeng, jinên ku ji bo civak û bi taybet ji bo jinan têkoşîn dikin, hedef bigrin. Lê berovajî vê yekê dema şehîdxistina hevalan, hêza me ya têkoşînê xurtir bû. Ji şehîdxistina wan hêrsa me ya li dijî dagirkeriyê xurtir bû.

Di dawiyê de em vê yekê dibêjin şehîd Gulistan û Hêro her wiha hemû hevalên me yên di oxira rastiyê de canê xwe feda kirin, bila giyana wan rihet be em şopdarê ked û rêya wan in. Heta dawiyê em ê bibin deng û rengê civaka xwe".

Hêjayî bîrxistinê ye ku di 30'ê Tebaxê de cenazeyê Gulistan Tara li bajarê wê Êlihê bi awayekî girseyî hate pêşwazîkirin û oxirkirin.

# 'Jina Kurd sembola hêz û azadiyê ye'

**Stêrk Mihemed/Qamişlo**

**Endama Meclisa Dîplomasî ya Ewropayê Mizgîn Ehmed diyar kir ku jina Kurd jina bi rêxistinkirî ye û jina bi rêxistinkirî jinek bi bandor, hêz, îrade û zane ye û wiha got: "Jina Kurd mînaka hêz û cesaretê ye."**

Tevahî cîhan bi hêz û têkoşîna jina Kurd bandor bûne, jina Kurd bûye mînaka îradeya xort û cesaretê. Tevahî jinên cîhanê bi gotina Jin, Jiyan, Azadî bandor bûne û ji bo tavahî jinan ev gotin gîrîng e û wateyek wê ya kûr heye. Ev gotin li gel jinê kurd destpêkir û niha li tevahî cîhanê belav bûye, ev ne tenê sê peyvin lê belê wateyek wê ya tijî berxwedanî, têkoşîn, azadî, israr û hêz heye.

Di derbarê bandora hêza jina Kurd li cîhanê Endamê Meclîsa Dîplomasî ya Ewropayê Mizgîn Ehmed ji Rojnameya me re axivî.

**'Jinên Kurd nîşaneyên rêxistinkirinê û hêzê ne'**

Mizgîn Ehmed da zanîn ku jinên Kurd jinên bi rêxistinkirîn e û wiha pê de çû: "Jinên Kurd li ser bingehê rêxistinkirinê xwe dane destpêkirin, ji be vê jî jinên Kurd sembola aştî û azadiyê ne. Dema ku rêxistin hebe, zanebûn, cesaret, hêz û îrade jî heye, ji ber vê yekê jinên Kurd bi bandorin. Li her derê jina Kurd ji ber hêz, berxwedanî û têkoşîna xwe bûna mînaka serbilindiyê. Bi rêxistinbûnê re zanebûn tê û eger zanebûn hebê tê wateya ku nexşerêya jiyanek azad ji xwe re diyar kiriye.

Li tevahî cîhanê û ji her jinekê re gotina Jin, Jiyan, Azadî bi watey e. silogana her jinekê ev gotinin. Ji bo redkirina tundiyê li ser jinan û neqebûlkirina destdirêjiyê, tundî, zor û desthilatdariyê, tevahî jinên cîhanê dadikevin kolanan û silogana Jin, Jiyan, Azadî dibêjin. Ev sê peyvin, lê wateya wê pir kûr e. Tevahî jinên cîhanê bi vê gotinê bandor bûne."

**'Ev sedsalin zordarî li ser jinan bû'**

Mizgîn diyar kir ku Ev sedsal, sedsala qirkirina gelan bû û wiha domand: "Ev sedsal sedsala qetilkirin û qirkirina gelan bû, di nava wan de qirkirina û qetilkirina jinan jî bû. Li Şengalê gelek jin hatin qetilkirin, ji ber ku di wê demê de jinan xwe zêde bi rêxistin nekiribûn, lê di dema niha de jinan xwe bi rêxisrinkirin e û xwe perwerde jî kirine mînaka vê yekê jî Bakur û Rojhilatê Sûriyê ye, ku li wê derê jin bi awayekî rêxistinkirî ye herwiha cihê xwe di nava leşkertiyê, siyasetê, perwerdehiyê û hevseroketiyê de jî digire. Jina Kurd ne tenê li Bakur û Rojhilatê Sûriyê, li belê li ser çiyayan hertim pêşengtiyê dikin û sembola hêz, cesaret û azadîxwaziyê ne. Jinê Kurd dema ku têkoşîn û şer ji bo azadiyê dike, ne tenê ji bo jinê Kurd lê belê ji bo tevahî jinên ku rastî zor û zehmetiyan tên dikin, ji ber vê yekê jî tevahî cîhan bi jina Kurd bandor bûye. Tevgera jina Kurd bûye hêza dînamîkî ya guhertin û veguhertinê li tevahî cîhanê."

**'Jin li her derê pêşeng in'**

Endamê Meclîsa Dîplomasî ya Ewropayê Mizgîn Ehmed axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Berî niha bi salekê bi pêşengtiya jinên Kurd re komfederîzma demokratîk a jinên cîhanê re çêbû, gava yekem konferansa ku hemû welatiyên Ewropayê, aktîvîstên jinan beşdarî vê konferansê bibin û her kes li



gorî nêrîn û zanebûn xwe xwedî li wê konferansê derkevin û di wê konferansê de gotin ku em dikarin komfederîzma demokratîk a jinên cîhanê ava bikin. Kar û xebatên me berdewamin û hewaldanên me hene ku em hemû jinên di nava rêxistinan de kombikin û bikin hêzek, ji bo ku em li hemberî sîstema kapîtalîst û qirkirina li ser jinan bisekinin. Ev sekna ku îro em disekinin bi saya ked û têkoşîna jinên Kurd ku 52 salin ked, têkoşîn û berxwedaniyê dikin ne , hemû serkeftinên ku îro dibin berhemên wan jinan e."



# Ji çiraxên hunera kurdî

**Can Yûsif**

Hunermend Adil Feqe dengê kelepûra Dêrik û ruhê strana kurd a Cezrawî ye.

Hunera kurdî, isbat kiriye bi taybetî bi rêya stranbêjiyê ku ew ji vegotinek hestyarî bêtir e, ew kiryarek çandî ya berxwedêr e, ku nasname, ziman û kultûr di şert û mercên herî dijwar û tarî de parastiye, mirov nikare van beşdariyan ji dîroka siyasî û civakî ya kurdan veqetîne û ne jî rola hunermendan wek parastvanên rûhê civakê di rûyê hewldanên ku napejirînin û betalkirinê de wenda bike.

Hunermendê Kurd Adil Feqe yek ji dengên herî navdar ê ku rolek girîng lîst di vejînkirin û belgekirina folklora kurdî û parastina mîrasa çandî di riya xebatên xwe yên stranbêjiyê ku bi dengê xwe yê germ û xweş û şêwazê xwe yê taybet di stranên folklorî de tê nasîn, ku mîras û çanda herêmê nîşan dide.

Adil Feqe, kurê bajêrê Dêrikê, ew bajarê ku zendewa bi huner û bêrîkirinê, ku li ber ronahiya heyvê radikeve û li ber awazên zirnê şiyar dibe, ew di nav himbêza wê ya germ de mezin bûye, ku li wir, kolanên kevnare çîrokan dibêjin, dêliyên mêwên tirî ronahiyê himbêz dikin û xuşîna ava kaniya Eskeriyê razên zaroktiyê vedibêje, li wir zigilên Dêra kevnare lêdidin, mîna dilê bajêr dijenin, nîşanên destpêkê yên wî hatin xuyakirin û rûhê wî li ser nebeza çanda kurdî hate vekirin, piştî ku hilmijî ji germiya zarokatiyê û bênxweşiya kolanên kevnare, wî gavên xwe yên pêşîn ber bi hunerê ve avêt, bi eşq û evîn, bê rawestandin despêkir .

Di dilê bajarê Dêrikê hunermend û stranbêjê kurd Adil Feqe di sala 1956'an, ji dayîk û bavek kurd (Ehmed Feqe Hesen û Emîna) hate dinyayê. Ew di himbêza bajarekî tije ji hestê bedewî û çandî de, mezin bûye, bajarekî ku her dem minareyek bû ji bo raman, wêje û hunerê, li wir rêwîtiya wî destpêkir, huner veguhêrand peyam û nasnameyê, ew di nav malbateke kurdî ya welatparêz, hunerhez û evîndarê huner, mûzîk û stranbêjiya kurdî ya resen de mezin bû, ew bi şêwazê bavê xwe bandor bû - hunermendê nemir Ehmed Feqe Hesen - û ji xanim Meryem Gorê ya ku mîna çavkaniyekî diherikî ji stranên folklorî, wê bandorek kûr li ser jiyana wî kir û şopek zelal li ser kariyera wî ya hunerî hişt, ew ji dibistana bavê xwe, ya stranbêjiyê ya ku tê nasîn ji hêla hevsengî û pabendbûna bi bingehên meqamên mûzîka kurdî ve, fêrî stranên filoklorî bû, wî di şêwazê xwe de pişta xwe da vegotina rast û awazê resen, û ji xanim Meryem jî, wî hest û têgihiştinekî bilind a maqamê wergirt wî pêlpêlokên dengî bi şêwazekî ku hevbexşiyê bike di navbera kevneşopî û nûvekirinê bikaranîn di gel parastina ruhê kurdî di deng û rewaha xwe de, ev bandor ne tenê kevneşopî bû, lê berfirehiyek xwezayî ya mîrateyek hunerî bû ku li ser wê hatiye perwerde kirin û wî bi riya xwe ya taybet hûnande, da ku bibe dengek hemdemî ku kokên paşerojê û taybetmendiyên pêşerojê di heman demê de bi hev re hilgire.

Hunermend Adil Feqe di hembêza bajarekî ku bi hunerê zindî û bi çanda kurdî jîndar, ew di nav kolanên wê yên kevnar de, di navbera dîwarên wê yên ku hîn jî dîroka kevnare vedibêje û bêhna nanê germ û dengên cîranan diparêze, wî zarokiya xwe ya pêşîn derbaskir. Di bazdana di bin dêliyên mêwên tiriyê dahelayî û liguhdana dengê xuşîna ava kaniya Eskeriyê wekî ku jêre stranan dibêje û pêre ringeringa zinglên Dêra kevnar û pêlpêlokên dengê Mela Hemdiya bi hevre wekî simfoniyek ji bawerî û xweparêziyê di giyanê wî de diafirîne, dengê wî bêhna xakê jê dibare û hestê wî mîrateya kevnare bi rûhê nûvekirinê re tevlîhev dike .

Adil Feqe ne tenê hunermendek e, lê ew neynika bîra gele û derbirîna rastîn ya nebeza bajarekî ye ku her demî bûye dergûşek ji bo torevanan û panaxek ji bo afrîneran û çavkaniyek ji bo ilhamê .Ew di nav malbatek di peywendiyên xwe yên civakî yên germ mezin bûye, ku peyv mîna avê dihate vegotin û çîrok wekî stranan dihate parastin û ezberkirin. Wî ji dayîka xwe dilovanî wergirte û ji bavê xwe, ew fêrî nirxê gotinê û rêzgirtina keleporê bûye. Ji zarokatiya xwe ya destpêkê ve, nîşanên hinêrtiyê ji navbera tiliyên wî diherikîn û wiha, di dilê Dêrikê de, ruhê wî li ser bedewiyê vebû û ji zaroktiya xwe ya azad, bingehek hunerê çêkir - hunerek ku qet ne tenê wekî vegotinê bû, lê berdewamîya nasnameya wî û bertekek kûr a bîranîna miletekî bû.

Wî qonaxa seretayî, amedekarî û navîn li bajarê Dîrêk xwend, piştre xwendina xwe ya zankoyê li bajarê Şamê di kulîjeya wêjeyê, beşê erdingariyê de, di sala 1982'an de qedand û li dirêjahiya şeş salan, (1980 heta 1986'an), ew wekî mamosteyê waneya erdingariyê dixebitî li dibistanên Gundê Girê Şêra û Dêrikê.

Di sala 1980'an de, ew zewicî bi xanim Cînan Mezîd re û wan çar zarok hene (du kur û du keç). Di sala1986'an de, ew ji Rojava derket û berê xwe da Ewropa û kişwera Swêdê niştecih bûye. Adil Feqe dest bi kariyera xwe ya hunerî kir di temeneke biçûk de, di bin bandora mîrateya mûzîka kurdî ya dewlemend de û li ber destê bavê xwe Ehmed Feqe Hesen fêrî stranbêjiyê bû, ku yek ji kesayetên navdar ên hunerî yên Dêrikê tê hesibandin û roleke bingehîn lîst di avakirina jîngeha çandî ya ku Adil di nav de mezin bûye,, herwiha bandorek kûr ya stranên folklorîk ên şehsiwarên hunera kurdî, wek (Mihemed Arif Cezrawî, Hesen Cezrawî, û Tehsîn Taha .h.d..), li ser kariyera wî ya hunerî hebû. Hunermend Adil Feqe tê nasîn ji hêla rewanekirina xwe ya ji stranên folklorîk re, ên ku rastiya çand û nasnameya kurdî nîşan didin, bi karanîna dengê xwe yê hêzdar û hestê xwe yê kûr.

Ji berhemên wî yên hunerî yên herî berçav çar albûmên stranên kurdî yên folklorîk û neteweyî hene, ev albûman di nav xwe de komek stranên folklorî digirin ku wî bi şêwazê xwe yê taybet vejandine, nûjenkirine û ji nû ve pêşkêş kirine, mîna :

1-Narînka Çiyayî.
2- Dewat hate hewşa mezin.
3-Xelefim.
4- Şahîno.

Herwiha hêjmarek ji stranên wî yên neteweyî jî hene ku bala girseyek berfireh ji gel kişande ji her temenên cuda, mîna:

1-Ji dûriyê
2-Dûrim dûrim.
3- Dermanê dil
4-Dîlberê

Stranên wî dengvedanek berfireh girtin di nav hezkirên muzîka kurdî de, li Ewropa û Kurdistanê. Hêjayê gotinê ye ku Adil Feqe bavê hunermenda kurd a navdar, Narîn Feqe ye, ku destpêka rêwîtiya xwe ya hunerî bi stranek hevbeş bi navê 'Dîlberê' bi bavê xwe re dest pê kir, ev jî nîşanek e ku bandora wî ya hunerî di malbata wî de nîşan dide.

Adil Feqe yek ji dengên resene ku di dilê bajarê Dêrikê de mezin bûye, ji zaroktiyê xwe ve, ew bi çanda herêmê û mîrasa wê ya stranbêjiyê ya dewlemend firşik bûye. Wî zarokiya xwe di nav kolanên kevnar ên bajêr de bûrandiye, ku jê re bûne qadeka dewlemend a xeyal û bîranînên çandî, ku mîna dayîndeya yekem bû ku pêşwaziya hinêra wî ya hunerî kir, giraniyeke taybet ya dengê wî di nav civaka herêmî de hebû, ji ber germî û rastiya hîsê wî yê vegotinê.

Wî jiyana xwe bi hunermendên mezin yên Dêrikê re mîna Abdo Elanî, Mihemed Teyîb Tahir, Reşîd Elanê, bavê xwe Ehmed Feqê Hesen û Meryem Gorê re derbas kir, ku roleke girîng di pêşxistina tecrûbeya wî û geşbûna dîtina wî ya afrînerî de lehîstin, ew ji serpêhatiyên wan fêr bû, li cem wî kûrahiyeke hunerî ya hêzdar



dan afirandin ku karî têkilkirinê di navbera awaza mîrateya kurdî û hestê hemdem de çê bike.

Hunermend Adil Feqe bi komek hunermendên Dêrikê re, mîna (Cemal Sadûn, Ednan Îbrahîm û Şevger Mirza ) beşdar bû di damezrandina komek hunerî de, bo vejînkirina konser û dewatên gelêrî yên li bajarê Dêrikê, bi şêwazek nûjen û di nav holan û yaneyên fermî de, ev kom tenê bi salekê berdewam kir.

Di heman demêde, hunermend Adil Feqe wekî mêvanê rûmetê bi gelek hunermendên kurd ên Rojavayê Kurdistanê re beşdar bû di pêşkêşkirina beşên stranan de, di şevbuhêrkên stranbêjiyê, konser û dewatên gelêrî de, mîna:( Ebdo Elanê, Seyîd Yûsif, Mihemed Şêxo, Mehmûd Ezîz Şakir û hwd.) re . Herwiha ew beşdarî gelek bernameyên candî û hunerî li ser ekranên êzgehên herêmî û navendên medyaya civakî bûye, mîna bernameya (Sefqan û Mêvan), ku ew têde li ser rêwîtiya xwe ya hunerî û tecrubeya wî di stranbêjiya folklorîk de û bandora bavê wî û hunermendên Kurd ên mezin li ser wî axiviye; ji bilî ku wî vejîna gelek êvarên hunerî li navendên çandî yên cihêreng kiriye û rolek girîng lehîste di piştgiriya hunera armancgêr û çalakkirina tevgera çandî ya herêma xwe de ku armanca wê parastina mîrasa kurdî û nasnameya çandî û hunerî pêşve bibe .Bi rêya beşdariyên xwe di festîvalên navneteweyî yên hunerî de û bi weşanên xwe yên ku dengvedanek li nav komên revendên kurdî de li derve çêkirin. Adil Feqe karî bi serkeftinî deng û strana kurdî bi awayek rûmetdar bighîne cîhanê û nûnertiya rûyekî ronahî ji şaristaniya kurdî re bike, wî nimûneyek ya hunermendê pabendekar diyar kir ku huner bi peyam ve, deng bi dozê ve girêdaye .

Bi rêya van karan, Adil Feqe nîşan da ku hunermendê rastîn ne bi hejmarek stranan tê pîvan, lê bi qasî bandora wê û rastiya wî, girêdana wî bi gel û doza wî ve heye, tişta herî bedew ku di derheqê wî de tê gotin:

"Hunermendek e ku gava stran dibêje, Dêrik bi dengê wî diaxive."

Wî stran ji bo evînê, ji bo axê, ji bo bêrîkirinê û hêvîyê gotine û bi dengê xwe, xwe xiste nav dilê heskiriyên xwe de. Li hindirê welat û derve de, bi dengê xwe yê zelal û xweş, wî rolek girîng lîst di parastina nasnameya muzîka kurdî û veguheztina wê bo nifşên nû, bi ruhekî rastîn û hewesek nûvekar. Adil Feqê ne tenê hunermendek an stranbêjeke ku hin stranên xweş dibêje, lê ew dibistanek hunerî û çandî ya mînake ku coş dide nifşên pêşerojê ji bo parastina mîras û zimanê Kurdî û pêşxistina nasnameya neteweyî û bedewiya wê bi rêya hunera rastîn nîşan dide. Adil Feqe ne tenê hunermendeke, lê ew rewşek wijdanî ye, tekez dike ku huner peyamekî berxwedanê ye û neynika şaristaniyê ye. Her kesê ku wî nas dike, di hindirê wî de berdewamiya zindî ya bîranîna Dêrikê û parêzvanê mîrasa wê yên mirovî û hunerî dibîne. Îro, ew yek ji navên herî berbiçav ku nûnertiya hunera herêmê dike, tê nasîn û karîyera xwe bi biryardariyê didomîne, ku dide ser milê xwe barê hunerê, hewesa xweparêzîyê û projeya nasnameya ku nayê vemirandin.

# Luqman Xelîl: Pakrewan Nûreddîn Sofî dîroka zêrîn bû

Rêhevalê têkoşînê û biraziyê fermandarê mezin Nûreddîn Sofî, Luqman Xelîl da xuyakirin ku şehîd Sofî bi hemû taybetmendiyê xwe bibû Kurdistanî û wiha got: “Heval Sofî ne tenê fermandarê şer bû, di heman demê de dîroka jiyanê bû.”

**Argêş Vîyan/Qamişlo**

Di derbarê jiyan û têkoşîna bêhehmpa a Fermandar Nûredîn Sofî de, rêhevalê wî yê têkoşînê Loqman Xelîl pirsen rojnameya me bersivandin û naveroka hevpeyvînê wiha bû:





**-Hûn weke rêheval û mirovekê wî dikarin qala jîyan û serpêhatiya fermandar Nûredîn Sofî bikin?**

Em ê kengî bibin xwedan heq, ji mijara heq re ked û berdêl pêwîst e. Mirov 24 saetan kar neke nabe xwedî mal û xanî. Tu kar nekî, xwe newestînê, nikarî ji zarokên xwe re cil û bergên cejnê bikirî. Ev mijar ji bo welatekî jî derbasdar e. Ji bo mirov karibî welatekî azad ava bikî û tê de bi aramî bijî, di vî welatî de ji bo rûmet û nirxên mirovî bê parastin ked û berdêl divê. Xwîn jê re pêwîst e. Ti kes bi xweşî welatekî nade me. Gelek şer çêbûn, gelek rêxistin û tevger hene. Hindek bi navê îslamê, hindekan jî bi navê netewî li ser gelek hişmendî û nêrînên cuda hatine avakirin. Lê tu tevgerek mîna PKK’ê derneketiye û çênebûye. Bawer nakim ku derkeve jî. Gelek tevgerên bi navê herî pîroz yên weke; İslam, şerîet, Qur’an û Xwedê hebûn. Yek ji wan jî El-Qaide bû. Endamên El-Qaide, heta ku malbata xwe ji bîr nekira çalakiya xwe ya fedayî pêk nedianî. Piştî El-Qaide, DAIŞ derket. Wan jî heman tiştî kir. Ger endamên DAIŞ’ê, destpêkê mal û milkên xwe, malbat û zarokên xwe nedana kêlekekê nediçû çalakiya fedayî nedikirin. Niha ji gelek netewan gelek serçeteyên DAIŞ’ê li gel me girtî ne. Heta niha jî perê van serçeteyan hene. Lê tekane tevgera ku xwe spart xizmeta bêyî berjewendî, bê dem (süresiz), bêyî ku hisabê kevirê gorekê jê re bikin Tevgera Azadiya Kurdistanê ye. Dest ji xanî, mal. milk û tiştî berdaye. Têkoşerên Kurdistani bi vê baweriyê şervanên xwe perwerde û zana kir. Yêk ji wan fermandaran Hevalê Nuredîn Sofî bû. Bi sedan, hezaran hevalên wî li dora wî kom bûn. Em çûn kîjan bajarî, şehîdên me ji wî bajarî mezintir bûn. Ev ne mijareke ku em pê qels û lawaz bibin. Berdêla ku hatî dayîn, me xurt dike, li ser linga dihêle û vîna me mezin dike. Baweriya me mezintir dike. Çima? Ji ber em dizanin ku; ne tenê ne. Yên xelkê; artêşa tang, top ş balafir hene lê ya me jî artêşa şehîdan heye. Partiya ku ava bûye, partiya şehîdan e. Mirov di taliyê de dê bigihê dawiya temenê xwe. Ji dervî vê axê cihekî me yê din tine ye. Lê weke Serok APO dibêje; ‘‘Ya girîng ne ew e ku mirov çend salan dijî, ya girîng ew e ku berhemek û şopek li dûv xwe hiştin e.’’. Niha em hemû hevalên wî di beranberî wî de amade ne. Berhemên ku Hevalê Nuredîn Sofî hişt, kêm mirov karî bike. Kêm kes bandora ku wî kirî dikarîbû bike. Tişta ku hevalê Sofî, çêkir, afirand û ciwanî-bedewiya dayî heval û rexistina xwe kêm kes karî vê bike. Ne tenê ji bo xwe. Ev bandor û hezkirina xwe da gelên din jî. Hevalê Sofî, bi xweşiya ku dayî gelê xwe û hevalên gelê xwe serbilind in. Her şahadetek bi êş û zehmet e. Ez zarok bûm, li malê bi rojan û mehan li ser destî wî razam. Heta piştî salan, li wan çiyayan jî li ser dest û milê hevalê Sofî razam. Beriya demekê kurt jî me hevalê Sofî li ser milê xwe anî vir. Em ê çiqasî layiqî şehîdên xwe derkevin, ev li ser wijdanê me maye. Ev mijar bi sekn, hevaltî û dostaniya me ve girêdayî ye. Tiştên ji me tê xwestin ev in. Di dilê me de gelek deng û gotin hene. Lê zimanê me venagere ku ew hestên me bîne ziman. Ne ku ez biraziyê wî me û ew jî apê min e. Ew qehramanê me û gele xwe bû.

**-Şahadeta Hevalê Sofî li ser civakê çiqas bandor kir?**

Ev tevger beriya ku ava bibe me şehîdê xwe yê destpêkê da. Beriya ku Tevgera Azadîya Kurdistanê bibe xwedî sempatîzan, rêxistin û çekek me şehîdê xwe da. Tolhildana Serok APO nedişibiya ti tolhildanekê. Tolhildana Serok APO bi qîmet û wate bû. Tolhildana Rêber Apo xizmeta mirovatiyê kir û bandoreke gelekî mezin ava kir. Li ser bedel û zehmetiyan Tevgera Azadiya Kurdistanê hat damezirandin. Yên bixwazin Tevgera Azadiyê nasbikin, divê li ser xwîna şehîdan nas bikin. Ev tevger li ser heqîqeta fedayiyan ava bû. Tekoşina Rojavayê Kurdistanê li ser rastiya dilnizm û fedakariyê avabû, YPG li ser xwefedakirinê avabû. Ev tevger ji roja destpêkê heta îro bi heman coş, xwestek, israr û manewiyatê heta roja me ya îro hat. Ruxmî ku êrîşên gelekî giran li ser me hebûn ev tevger karî xwe mezin bike û li ser lingan bimîne. Merasîma girseyî ya fermandar Nûredîn Sofî nîşanî me da ku ewqas berdêl hatin dayîn lê gelan komî serhev kir. Hat dîtin ku bê ku fikir û cûdaxwezî bikeve nav hemû pêkhate û rêxistinên Kurdistanî merasîma Şehîd Sofî de amade bûn. Mebi çavên xwe dît, di vê germa havînê de ger ji gel re bihata hiştin dê tabûta hevalê Sofî ji Dêrik heta Qamişlo li ser milê xwe bianiya. Ger em li mala dê û bavê xwe bûna, ti kes dê ji ber me ranebûna. Ti kes ne neçare ku ji bo rêzgirtinê ji ber me rabe. Lê li Dêrik, Qamişlo, Kobanê, Reqa, li seranserê Bakur û Rojhilatê Sûriyê gelên me rabûn û xwedî li şehîdên xwe derketin. Li Amedê jî gelê me rabû. Çima? Ji bo ku yek ji wan kesê li Amedê şer kirî jî Hevalê Nuredîn Sofî bû. Berpirsiyarê leşkerî yê Amedê bû. Ji Amed, Botan û Serhedê, heta Zagros û Ewropayê çalak bû. Ev bi xwe dîrokek e. Rast e, êşa me giran e, lê em bi vê serbilind in. Şahadeta her hevalekî ji me re cihê şanazî û sedema serfiraziyê ye. Bi her şahadetekê dîlan û govenda azadiyê berfirehtir dibe.

**-Ji bo parastina mirateya Şehîdan û pêkanîna fermana wan, hûn weke endamê fermandariya QSD’ê çi dibêjin?**

Serok APO vê dibêje; ‘‘ger tu tevlî Partiyê bibî, tu camêr î. Tu nikaribî jî alîkariyê bike.Tu nikaribî alîkariyê jî bikî, di nav şevbêrk û kombûnekê de gotineke baş di derbarê me de bêje. Tu vê jî nikaribî ji me re dua bike. Tu vê jî nikaribî bi tenê welatparêz be.’’

Ango li gor Serokê me, tu tevlî bibî jî û duayekê jî bikî dîsa tu camêrî. Wateya van gotinan çi ye? Yekîtiya ruhî ye. Yek ji me jî hevdû nasnake. Lê şehîdan vê yekîtiya me ava kir. Em hemû di bin al û wêneyên wan de digihên hevdû. Gotinên em bêjin, ti carî têrî kar û xebatên ku şehîdan kiriye nake. Tişta ji me re hiştî, dîrokeke bi serkeftinan ve dagirtî ye. Divê em vê dîrokê binivîsin. Ji zarokanî, heta ciwanî, serdema xwendekarî, tevlîbûna şoreşê û heta kêliya şahadeta xwe divê Hevalê Nuredîn Sofî bi çi şêwazî be divê bê zanîn û nasîn. Ev erk a me hemûyan e. Rêya Hevalê Sofî rêya me hemûyan e. Rojekê em ê jî vegerin axê. Li dervî vê ti lêgerîneke me ya din nîne û ji vê manewiyatê ti fikareke me tuneye. Em kêfxweş in ku; em di nav gel, heval, xizm û ehlê xwe de ne. Hemû heval û hogirên li vir amade û yên ne amade, bi me re heman êş û manewiyatê dijîn. Di sala 2022’yan de çûm li gel Hevalê Cemal, li ser hevalê Sofî 2 deqeyan axivî piştre sekinî û got ez nikarim biaxivim. Min ji hevalê Abbas pirsî, Ew jî got nikarim biaxivim. Rondik ji çavên wî niqutîn. Beriya demekê dîsa çûm li gel hevalan, min heval Cemal dît û ji min re got; dibe ku ez niha karibim di televîzyonê de li ser Hevalê Sofî biaxivim Altun, Hevalê Fûat (Ali Haydar Kaytan) û Hevalê Koçero gihaştin şahadetê. Van hevalan PKK’ê avakiribûn. Hevalê Koçero jî xwarizyê Serokatî bû. Di nav rêxistina me de bi hezaran hevalên me gihaştine şahadetê. Lê şahadeta Hevalê Sofî di asta giştî Kurdistanê de li ser tevgera me bandoreke mezin çêkir. Ev berdêl ji boyî me hemûyan gelekî giran bû. Ne ji ber ku em mervê hevdû ne. Ti têkiliya xwe bi mêrantiyê re nîne. Beriya hevalê Sofî, hevalê Riza Di cîhanê de, ti tevgerekbiaxivim. Tevgera Azadiya Kurdistanê ku fermandarên xwe li pêş in tine ye. Ev taybetmendiya Tevgera Azadiya Kurdistanê ye. Fermandarên wê Tevgerê weke Gelhat weke Rûbar weke Sofî ya ne, her dem li pêş in û di dilê wan de dudilî nîne. Ji wan çi bê xwestin dikin. Ji eniya herî paş heta eniya herî pêş ji boyî her derekê timî amade ne. Sekna Hevalê Nuredîn Sofî ji boyî me cihê serbilindî, şanazî û rûmetê ye. Hevalê Sofî di hema bêje hemû hemleya ku hemberî çeteyên DAIŞ’ê û komên çetr yên din de fermandari kir û têkoşîn meşand. Weke hevalê Mazlum ji ani li ser ziman bi kuştina serçeteyên DAIŞ’ê Ebubekir Bagdadi de roleke mezin list. Em çi qasi behsa hevalê Sofî Nuredîn bikin em ê kêm bimînin. Li gori têkoşîna ku rêheval Sofî da destpekirin, gelek tevlîbûn di malbatê de çêbun. Min qet bawer nedikir ku karibim li ser Hevalê Sofî biaxivim. Em deyndarê deyndarê rê heval Ji niha û şûnde jî wek heval û biraziyekî Wî çi ji destê me bê, em ê texsîr nekin.



# Ji destpêka salê ve 2248 qezayên tirafîkê li Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê rû dane

Ji destpêka sala 2025’an û heta niha, li herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê 2248 qezayên trafîkê rû dane. Rêveberê Tirafîkê yê Bakur û Rojhilatê Sûriyê Eymen Ibrahîm diyar kir ku sedema bingehîn ya qezayên tirafîkê nepêkanîna zagon û hişyariyên tirafîkê ne.

**Birûc Resûl/Qamişlo**

Ji bo xizmeta civakê, di dawiya sala 2013`an de navendek bi navê ewlehiya civakê hat avakirin, paşî di sala 2014`an de navê wê veguherî navenda tirafîkê. Weke tirafîk bi demê re kar û xebatên xwe pêşxist û gelek xizmet ji bo rêxistinkirina civakê kir. Di vê çarçoveyê de Rêveberê Tirafîkê yê Bakur û Rojhilatê Sûriyê Eymen Ibrahîm ji Rojnameya me re axivî. Eymen Ibrahîm di destpêka axaftina xwe de bal kişand ser kar û xebatê trafîkê ji destpêka salê heya roja îro û wiha got: “Ji bo kar û xebatên me yên sala 2025`an, bê guman ku di destpêka vê salê de rêjîma Baas hat helweşandin û ev jî bû sedem ku gelek tevlîhevî di hundirê herêmê de were derketin, em dikarin bêjin ku di aliyê lev û tevgerê de belavbûyinek çêbû. Ji ber vê yekê me têkiliyên xwe bi rêveberên Ewlîkariya Hundirîn re xurtir kir da ku di aliyê çûn û hatina erebeyan sîstemek û kontrolek baştir were kirin. Ji ber ku piştî hikumeta Şamê ya veguhêz hatiye li ser desthilatdariya Şamê çûn û hatine erebeyan zêde bû û hinek tevlihevî derketin. Li ser vê bingehê biryar hat dayîn ku 3 derî werin vekirin ji bo çûn û hatinê, 1- deriyê milê Tepqayî 2- deriyê milê Ebûasî 3- deriyê milê Dêrezorê. Bêguman çi erebeyek ji derveyî Bakur û Rojhilatê Sûriyê were derbaskirin, mîna ji Şam, Heleb û beravê em wan erebeyan qeyd dikin wekî tedbîr, herwiha ev jî wekî birayarên nû hatine girtin ku em ji bo parastina herêmê, pêwîst e em nas bikin ku ev erebe ya kê ye, kengî û çawa derbasî herêmê bûye.”





### Perwerdeyên fêrkirina ajotina erebeyan

Ibrahîm destnîşan kir ku kar û xebatên trafîkê bi awayekî rêxistinkirî tê meşandin û wiha domand: “Kar û xebatên me yên Tirafîka Bakur û Rojhilatê sûriyê bi awayekî sîstematîk û rêxistinkirî tê meşandin, karên me yên rojane ew e ku displîna erebeyan di hundir û derveyî bajaran de werin çêkirin, di heman demê de erebeyên ku nehatine qeydkirin, bi awayekî fermî tên qeydkirin. Belê me di vê salê de hin biryar dexistin, ji bilî biryara ku 3 deriyê di herêmê de werin vekirin. Gelek kes hene ku erebeyên xwe kirine dibistan, bê agahiya rêveberiya Tirafîkê û dûrî çavdêriya wan xelkê fêrî ajotine erebeyan dikin. Ev ji dibû asteng li pêşiya karê me ku her kes xwe fêrî ajotine erebeyan dike bi awayekî ne fermî, ev jî dibû sedem ku qazeyên erebeyan zêde bibin. Ji ber vê yekê me biryar girt ku ev kesên perwerdeyên fêrkirine ajotina erebeyan didin bila serdanî ofîsa trafîkê bikin, da ku wekî ezmûnek ji wan re were çêkirin û li gor ezmûnên wan wê qoçanê perwerdeyên fêrkirina ajotina erebê ji wan re werin derxistin. Bê guman wê li gor şert û mercên sîstema Tirafîkê tevbigerin. Her wiha dibistanên me yên fîrkirina ajotine erbê hem yên girêdayî trafîkê, hem jî yên sivîl bi awayekî rêxistinkirî berdewam dike.”

### Perspektîf ji bo ajokaran tên dayên

Eymen diyar kir ku di herêma me de asta zanebûna ajotina erebeyan li cem welatiyan kême û wiha pêde çû: “Asta welatiyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê ya zanebûn û fêmkirina ji ajotine erebeyan lawaze, di heman demê de ne pêkanîna zagonên trafîkê dibe sedem ku hijmara qazeyên erebê zêde bibe, me hin perspektîf ji bo ajokaran bi rengê biruşûran dan belav kirin hem jî li ser malperên Tirafîkê yê sermî hat berlav kirin, heta me di hindirê wan perspektîfan de diyar kir ku pêwîste xurtkirina erebeyan di hinder û drveyî bajar çiqas be, da ku ne be sedem qazeyan bi xwe re bîne û hîn zêdetir bi baldarî bajo.”

### Astengî û zehmetî

Eymen Ibrahîm derbarê astengî û zehmetiyên li pêşiya wan derdikevin wiha got: “Yek ji astengiyên û zehmetiyên derdikevin li pêşiya me ku welatî asta zanebûna wan a ajotina erban lawaze û dibe sedem ku pirsgirêk zêde dibin. Ya duyemîn jî ev ciwanên bi temen biçûk ku bê perwerde û qoçanê erebê tajonin, her ku em ceza li pêş dixin jî her ev pirsgirêk xwe dubare dike. Ya din jî hijmara erebeyan di herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê zêdene, êdî herêm tije erebe bûne û bênesaziya herêma me biçûke, ew riyên fereh û mezin tune ne heya ku bi hijmarekî wiha bilind erebe werin bi kar anîn, her wiha ev dibe astengî û zehmetî li pêşiya Tirafîk, ji ber ku rê li pêşia qazeyan digire, di heman demê de di wan kolan û bajarên teng de û bi hijmarek ewqas bilind ji erebeyan em dixwazin dûzenek were çêkirin û pirsgirêkên qaza û belvbûne bajar dernekeve, bê guman hete ku rê nabe alîkar ji ajotine erebeyan re, yek ji sedemên pirsgirêkên qazeyên erban rê ye, Tirafîk pir zehmetiya dikşînin, bi taybet ku hijmara Tirafîkê ne têrkere ji hijmarekî wiha bilind ji erebeyan re, pêwîste hijmara Tirafîkê zêdetir be da ku kontrolek were çêkirin. Lê belê têkiliya me bi saziyên eleqdar re hene mîna Şaredariya gel, yekîtiya ajokaran û ofîsa veguheztinê bi rengekî rojane em bi hevre têkiliyê dikin da ku pirsgirêkên erebeyan zêde nebin û bi Tirafîkê re bibin alîkar.”

### Sedemên qazeyan

Ibrahîm di berdewamiya axaftina xwe de wiha got: “Sedemên ku qaze zêde dibin, ew e ku welatî li gor zagon û perspektîfên Tirafîkê tevnagerin û gorxwebûyin li cem wan pêşe, yek ji sedemên qazeyan, ku ciwanên bi temen biçûk erebe û mîtoran bi rengekî pir xurt û ne baldar tajonin, ji bilî xurtkirinê ne perwerdekirî ne. ya din jî me biryar derxist ku camên erebeyan newin reşkirin (fîmekirin) lê dîsa jî em dibînin ku çawa welatî guhdar nake û camên ereba xwe hemî reş dikin, ev dibe sedem ku ajokar li pêşiya xwe nebîne û qaza çêbibe, her cara ku trafîk van kesên li gor biryarên Tirafîkê naçin tên cezakirin, lê disa jî encan lawaze, eynî kêmasê xwe dubara dike. Ji bilî vê jî gelek ajokar hene di dema ajotinê erebê serê wan di telefonan de ne, ev jî debe yek ji sedemên herî mezin yên qazeyan, eger mirov di ajotine erebê de ne balder be û mêjiyê wan ne li ser rê be wê mal û can jî bide. Sedema din jî xurtkirina erebeyan di hundirê bajaran û derveyî bajaran. Niha me nêzî 200 zagon ji ajokaran re diyarkiriya, bê guman yê ku gor wan zagonan neçe helbet dibe sedem ku qaze çêbike.”

### Perwerde û pesporî

Eymen diyar kir ku di destpêka vê salê gelek gef li pêşiya wan derketin û wiha pê de çû: “Ji bo perwerdekirina endamên trafîkê, vê salê gelek gef li pêşiya me derketin, mîna êrişên dagirkeriya Tirk û hedehgirtina wê ji cihê Tirafîk, Ewlîkariya Hindirîn û Akademiyên perwerdê, ji ber vê yekê derfetên perwerdekirinê û pesporiyê çênebûn. Perwerdeyên îsal piraniyên wan di hundirê navendan hatin dayin û ev yek ne têrker bû, ji ber ku di aliyê meslekî de lawaz man. Em dikarin bêjin ku kêmasiyên me yên kêmbûne dîtina perwerde hene, lê em hewil didin ku em perwerdeyên xwe yên fikirî û meslekî bi awayekî serkeftî bidin, heya ku em kêm perwerde didin endamên tirafîkê wê ewqasî pirsgirêk û kîmasî zêde bibin, çareseriya kêmasiyên tirafîkê perwerde ye.”

### Xebatên dema pêş

Eymen Ibrahîm kar û xebatên demên pêş eşkere kir û wiha got: “Niha em hazirtiya dibistanekî ji bo perwerde fêrkirina ajotina erebeyên mezin, di Sûriyê û li Bakur û Rojhilatê Sûriyê cara yekem dibistanek wiha ji bo perwerde fêrkirina erebeyên mezin tê vekirin. Çênabe ku kesek li ser hemî erebeyên mezin kar bike ango bibe ajokar, êdî her erebeyek mezin wê ajokar û pawernameyên wê cûde be, li ser vê bingihê kesê ku bixwaze li ser çi erbeyên mezin xwe ferî ajotinê bike dikare were xwe û navê erebeya ku dixwaze li ser perwerdê bibîne qeyd bike. êdî qoçanên erebeyan wê li gor her erbeyek cûda be.”

### Banga me ji bo gel

Rêveberê Tirafîkê yê Bakur û Rojhilatê Sûriyê Eymen Ibrahîm di dawiya axaftina xwe de wiha: “Banga me ji bo tevahî gelê me yên Bakur û Rojhilatê Sûriyê ku zagonên Tirafîkê pêk bînin û bi me re bibin alîkar, bila belavbûyin di hindirê bajarên me de pêş nekevin, ev yek jî ne tenê ji Tirafîkê tê xwestin, bê guman ji gel jî tê xwestin.”

Bîlançoya 8 mehan a binpêkirin û qezayên trafîkê, herwiha encamên qezayan li Bakur û Rojhilatê Sûriyê jî wiha ne:

Bi giştî 406 hezar û 479 binpêkirinên trafîkê hatin tomarkirin.

**Bîlançoya qezayan:**

Hejmara giştî ya qezayan: 2 Hezar û 248.

Hejmara kesên ji ber qezayan jiyana xwe ji dane:114.

Hejmara kesên ji ber qezayan birîndar bûne: 1255.

Hijmara erebeyên ku ji herêmê hikumeta Şamê derbasî herêma Rêveberiya xweser bûne: 13511

### Perwerdeyên ajokariyê

Hejmara dewreyên perwerdeyê yên vekirî yên fêrkirina ajokariyê: 66.

Hejmara kesên ku ji bo ezmûna ajokariyê serlêdan kirine: 3 hezar û 756.

# Ji bo siberoja cîhanê pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk

Berdevka Yekîtiya Jinên Kurd li Almanyayê Kezban Doxan diyar kir ku ji 27'ê Sibatê heya niha ji aliyê Tevgera Azadiyê ve gelek gavên şênber di aliyê pratîkî de hatine avêtin, lê dewleta Tirk piştî bangê bi 7 mehan tenê komisyon ava kir û di pratîkê de gavên berbiçav navêje û got, "Divê ne tenê ziman lê pratîka Tirkiyê jî bibe aştî."

**Ronahî Sadûn/Qamişlo**

Derbarê pêşdeçûna pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk a ku ji aliyê Rêber Apo ve hatiye destpêkirin, Berdevka Yekîtiya Jinên Kurd a li Almanyayê û endama Tevgeran Jinên Kurd a Ewropayê Kezban Doxan Bersiva pirsên Rojnameya me da û hevpeyvîn wiha bû:



**Pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk gihaştiye çi astê û astengiyên li pêşiya wê çi ne?**

Destpêkê di şexsê şehîd Nûredîn Sofî, Mam Zekî, Atakan Mahîr, Engîn Sîncar, Koçer û Bextiyar de hemû şehîdên şoreşê bibîr tînim ji ber em di meha Tebaxê de ne, ev meh jî aliyekî wê şîne û aliyekî wê şahiye. Herwiha salvegera pêngava 15'ê Tebaxê pîroz dikim, ji ber eger 15'ê Tebaxê tuneba, me ev pirsê we jî bersiv nedikarî bida, bisaya têkoşîna ku berî niha bi 41 salê hate destpêkirin, em niha di vê qonaxê de van tiştan nîqaş dikin.

Pêngava Rêber Apo ne tenê banga "Aştî û Civaka Demokratîk e" di heman demê de pêngava demokratîkbûnê di aliyê dewleta Tirk û Rojhilata Navîn de ye. Rêber Apo bi banga "Aştî û Civaka Demokratîk" pêvajoyeke nû da despêkirin û demekê de ku li Cîhanê kaûs, kirîz, şer, pevçûn, destdirêjî û çanda tecawizê pêş ketibû, di vê demê de banga Rêber Apo ji bo hemû cîhanê, di serî de Rojhilata Navîn bi taybetî Kurdistanê qonaxeke cuda bû. Ji 27'ê Sibatê heya niha di aliyê Tevgera Azadiyê de gelek gavên şênber, giranbuha, biwate, daxuyaniyên erênî û di aliyê pratîkî de jî pêk tên. Lê dema mirov di aliyê dewleta Tirk de meyze dike ji dema bangê heya dawiya meha Tîrmehê tu gavên berbiçav neavêtin. Piştî 11'ê Tîrmehê ku merasîmê çek îmhakirin hate kirin, nû êdî nîqaşê komisyon avakirinê destpêkirin. Dewleta Tirk bi vê yekê nêzîkatiya li hemberî vê pêvajoyê dide nîşandan, lewma ji serî û heta niha gelê Kurd biguman bû. Piştî avakirina komisyonê gaveke şênber hat dîtin. Lê mijare ne tenê komisyon avakirine, mijara ew komisyon bilezûbez ji bo aştî û civakeke demokratîk gavên şênber bavêje, ew gav jî di bin zagonên bingehîn û sîwana Meclisa dewleta Tirk de, ev jî pijrandine. Di aliyekî din de jî hin aliyên nijdaperest dixwazin vê pêvajoyê têk bibin. Lê bawerin êdî gelên Kurd û Tirkiyê wê neynê lîstika van nijadperestan.

**Dewleta Tirk çima bi rengekî giran ku ne li gorî tê xwestin nêzî pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk dibe?**

Em neçin sedsalên dîroka Osmaniyan, em bên sedsala dawî ya Komara Tirkiyê, ji roja pêşîn û heya roja îro li hemberî gelê Kurd her tim qirkirin, maf û hebûna wê neqebûlkirin e. Hikumeta niha ya desthilatdar jî ku piştî salên 2000'an û şûn ve hate ser desthilatdariyê hemû cûreyên şer ji bo gelê Kurd ji holê rabike pêk anî. Lê berxwedana gelê Kurd di serî de bi rêbertiya Rêber Apo, berxwedan û têkoşîna zindanan û ya Gerîlayên Azadiyê ev polîtîka hemû têk birin. Niha em bên van 3 salên dawî li Rojhilata Navîn, êdî siyaset piştî 7'ê Cotmeha 2023'an bilezûbez hate guhertin. Êrişên Îsraîl û Hemasê polîtîka Rojhilata Navîn serûbin kir û kevrên sereke hatin derzandin, berê yê ku digotin em serdestin bey me tiştek nabe, lê piştî 7'ê Cotmeha 2023'an ew kevir hemû serûbin bûn. Mirov dikare bibêje niha li Rojhilata Navîn kavilekî mirovahiyê heye. Li hemberî vê jî dewleta Tirk di van polîtîkaya de dît ku hegemoniya Îsraîlê her diçe pêşve diçe, di heman demê de piştgiriya hêzên desthilatdar digire wisa biçe jî wê têkçûna Komara Tirkiyê bê. Ji ber êrişên li hemberî Îranê ev tam berbiçav kir, serokê Îsraîlê jî ev vekirî ragihand ku dijminatiya xwe li hemberî vê erdnîgariya ku dixwaze bibe desthilatdar û dîrek dewleta Tirk jî hedef girt. Êdî dewleta Tirk jî ji ber berjewendiyên xwe hate, yanî ne ji kul û derdê gelê Kurd yan jî mirovahiyê ketibû heta ev gav avêt, lê ji bo têkneçûna xwe û dît Rêber Apo di vê pêvajoya şer, pevçûn û kawisan de rola sereke ya aştiyê ye û figûrê herî mezin ê di Rojhilata Navîn de ku vê hegemonyayê serûbinû bike.

Di kurdî de gotineke wiha heye; dema agir di mala te de be, tu nikare agirê di mala cîranê xwe de jî vemrîne, êdî tu niha di nava welatê xwe de aştiyê pêk neyîne, tu nikare xwe ji êrişên ku li ser te pêk bê jî biparêze, ji ber di hundir û derveyî te de agir heye. Komara Tirkiyê ji serî heya roja îro çawa ketiye tengasiyê de, piştgiriya gelê Kurd xwestiye, lê di wan deman de mixabin piştî ku dewleta Tirk rêya xwe dîtiye, Kurd ji holê rakiriye. Lê ya herî sereke ku Rêber Apo di wî alî de maf, hebûn û îradeya gelê Kurd parastin û ne tenê gelê Kurd a gelên ku li Tirkiyê dijîn ji bo ku bike bin garantiyekê de û Rêber Apo vê pêvajoyê wisa dide meşandin. Lê di 7 mehan de tenê komisyon avakirin ne tiştekî ji rêzê ye û ji bo pêveçûna pêvajoyê çê bibe, divê ew komisyon nîqaşan bixe pratîkê de. Dewleta Tirk jî dixwaze hinek demê gezec bike û bi mejiyê kapîtalîzmê nêzî pêvajoyê dibe. Di vê pêvajoyê de dewleta Tirk di serî de wezîrê karê wê yê derve axaftinê Hakan Fîdan ji bo Rojavayê Kurdistanê bi HTŞ'ê re, ew destkeftiyên gelê Kurd binpê bike, pratîkeke vekirî li hemberî Rojavayê Kurdistanê ku dewleta Tirk bi figurê xwe Hakan Fîdan dide nîşandan. Ev jî ne nêzîkatiyeke raste ji bo vê pêvajoyê, eger dixwaze bi gelê Kurd re biratiya gelan ava bike, tu ranabe li Bakurê Kurdistanê nabêje ez bira me û Rojava re nabêjim bombeyan navêjin, ev jî nêzîkatiyeke çewte. Ji bo wê heger birastî dewleta Tirk di vî alî de bi biryare, divê di serî de li hemberî Rojava van polîtîkayên xwe yên qirêj bide rawestandin. Yanî di aliyekî de bêje aştî û aliyê din jî ji bo destkeftiyên gelê Kurd ji holê rabike bi çeteyên HTŞ'ê re hemû plan û siyastên qirêj bide meşandin, ne raste.

**Ji bo azadiya fîzîkî ya Rêber Apo û dayîna mafê hêviyê were pêkanîn, pêwîst e li ser asta Kurdistanî û cîhanî çi kar were meşandin?**

Niha ji roja pêşîn ku Rêber Apo di aliyê fîzîkî dîl hatiye girtin û heya roja îro gelê Kurd tenê xwe di hedefekê de kilît kirin, hedef jî azadiya fîzîkî ya Rêber Apo bû, di hemû daxuyaniyên Tevgera Azadiyê, meşên gelan, helwestê jinan heman tiştê dibêjin ev 26 sal in azadiya fîzîkî ya Rêber Apo azadiya me ye. Niha çima gelê Kurd xwe di azadiya fîzîkî ya Rêber Apo de dibîne, ji ber Rêber Apo ne tenê şexsiyeteke, lê îradeya vî gelî ye, mifteya aştiyê ya xewin û xeyala bihezarê salan e û ev ji bo Rojhilata Navîn tevahî ye. Heta Rêber Apo di mesaja xwe yê dawiyê de ji bo jinan dibêje; Min rêgeza hêviya azadiyê da jinê, ev ne tenê da jinên Kurd, lê da hemû bindestan, kedkaran û jinên cîhanê. Ji bo wê yekê jî em dibêjin "Azadiya te azadiya me ye" lê heya niha axaftineke pozitî di aliyê mafê hêviyê de ku mirov tê de bibîne tuneye, lê belê em jin û gelên cîhanê di dîroka cîhanê de çawa tu maf bi dest ji aliyê desthilatdaran ve li ser tepsiya zêrîn nehatiye dayîn, çawa hata van rojan hatina gelê Kurd bi berxwedan, têkoşîn û berdêlên giran bû. Dîsa wê gelên cîhanê, di serî de jinên cîhanê û taybet jinên kurd ji bo ku mafê hêviyê pêk bînin kar û xebat û têkoşîna xwe berdewam bikin. Çawa Rêber Apo mifteya demokrasî û aştiyê ya Rojhilata Navîn be, ji bo azadiya wî ya fîzîkî jî mifte gelên cîhanê, jin û gelên kurd e.

**Di çarçoveya pêngava cîhanî ya ji bo azadiya fîzîkî ya Rêber hatiye destpêkirin, kampaniya "Ez dixwazim bi Rêber Apo re hevdîtinê pêk bînim" hatiye destpêkirin, tevlîbûna vê kampaniyayê di çi astê de ye?**

Kampaniya "Ez dixwazim bi Rêber Apo re hevdîtinê pêk bînim" ji aliyê kesên ku pêngava "Ji Rêber Apo re azadî ji pirsgirêka Kurd re çareseriya siyasî" dabûn destpêkin, hate destpêkirin. Heya niha jî kom bi kom serlêdanên ji bo vê kampanyayê têne kirin, ji Emerîka Latînî heya Efrîqyayê, ji Asya heya Ewropa, di wî alî de serlêdan wekî ku çawa pêngava ji bo azadiya Rêber Apo de her çû pêla wê bilintir bû, di vê kampaniya yê de jî wisa ye. Niha ne tenê gelê kurd gelê cîhanê tevahî Rêber Apo wek şexiyetekê tenê nabînin, lê wek feylesofê gerdûnê tê dîtin. Dema mirov li sedsala 21'ê tenê binere tiştên ku mirovahiyê ber bi tunebûn ve dibin heye. Lê Rêber Apo bi paradîgma xwe ya federalîzma demokratîk netewa demokratîk ji gelê cîhanê re bû rêgeza hêviya azadiyê. Ji bo wê her diçe ev kampaniya berfirehtir dibe. Gel dixwaze Rêber Apo bibîne ku ne tenê ji dahurandin, parêzname û hwd… yên wî sûd werbirin, lê bi dîtina wî û diyalogê ku karibin di welatê xwe de guhertin û veguhertinan pêk bînin, hevdîtinê bikin, firehbûna vê kampaniyayê jî wê wan rojan bi xwe re bîne.

Di mesaja 27'ê Sibatê ya Rêber Apo de hevokeke wî hebû ku digot: "Zimanê vê demê zimanê aştiyê û demokratiyê ye" Tegera Azadiyê jî ne tenê di ziman de, di pratîkê de vê dide nîşandan. Lê zimanê Tirkiyê mixabin ne ev ziman e ku gelê Kurd wek terorist dîtin, heta polîtîkayên wê li hemberî Rojava û Başûrê Kurdistanê xeta pratîkeya şer e. Lewma divê dewleta Tirk zimanê xwe biguherîne, berovajî ne zimanê şer be, ew jî zimanê aştiyê û demokratiyê bikar bîne. Di heman demê de gelê Kurd ji bo vê pêvajoyê pêş bixe gelek nîqaşên erênî dike, ji bo wê dewleta Tirk jî divê heman nîqaş bike. Guhertin û veguhertin ne tenê ji gelê kurd re pêwîst e, ji bo hemû gelên ku li Tirkiyê jiyan dike pêwîst e. Herwiha barhiştina vê pêvajoyê tenê li ser Rêber Apo û Tevgera Azadiyê nabe, pêwîst e civakî jî erk bigre ser milê xwe ku vê têkoşîna 52 salan tê meşandin ber bi serkeftinê ve bibin û nirxên berdêlan biparêzin.



## Pêvajo çawa dimeşe?

**Ahmet Aktaş**

Divê pêşî ev were gotin ku ji despêkê ve li ser pêvajoyê, gotin û hilwestên erênî hatin nîşandan.
Ji kesan heta sazî û dezgehan ên biçûk û mezin, ên netewî û navneteweyî, hema ji her cûre aliyan gotin û daxwiyaniyên erênî hatin bihîstin.
Bêgûman, aliyên yekser ên berpirsiyariyên pêvajoyê, aliyên Kurdistanî û dewleta Tirkiyeyê ne, lewma divê pêşî mirov bala xwe bidin hilwest û kiryarên van aliyan.
Hema pêşî em bala xwe bidin aliyên Kurdistanî û di serî de gotin, daxwiyanî û hilwestên Rêber APO û Tevgera wî.
Li pey wê, em bala xwe bidin kesayet, rêxistin û partiyên siyasî ên Kurdistanî, mirov dikare bêje ji ti kesan û nûneran gotinên nexweş nehatin bihîstin, bi piranî piştgrî hatin dayîn.
Her wiha mirov bala xwe bide aliyên navneteweyî jî, bi giranî erênî nêz bûn û destekên xwe, bi zelalî diyar kirin û hîn jî didomînin.
Ka îca em bala xwe bidin aliyê yekser têkildarên vê mijarê, di serî de dewleta Tirkiyê û li gel wê her 3 dewletên din ên dagirker Îran, Iraq û Rêveberiya demkî ya Sûriyeyê, ji bilî çend gotinên erênî, hema hema hilwest û kiryarên her 4 dewletên dagirker jî mîna hev in û neyênî ne, dijminkarane ne.
Dewleta Îranê, her heyv, nêzî 10 kesan darve dike û nîvên wan Kurdistanî û Belûcistanî nin.
Dewleta Iraqê, bi tevayî li gel siyaseta qirkirina Kurdistaniyan a dewleta Tirkiyeyê tevdigere; berdewam êrîşî ser Herêmên Parastina Medya, Mexmûr û Şengalê dike.
Rêveberiya Veguhez(demkî) a Sûriyeyê ya Colanî, dijî Kurdan, Durziyan, Elewiyan û hemû pêkhateyan, siyaseta dujminkarî her didomîne.
Dewleta Tirkiyeyê, ji xwe yekser rûberûyê/muxetebê vê pêvajoyê ye û gotina despêkê jî Devlet Bahçeli kir, ku ne kesekî ji rêze ye, belê hevkarê Serokê Rêveberiya Dewletê Receb Erdogan e.
Erê hinek gotin û gavên erênî jî avêtin weke damezrandina Komisyona Parlemenê, lê di demdirêjiya pêvajoyê de, sistayî û xemsarî ket gotin û kiryarên wan, ji xwe AKP, gelek li paş MHPê meşiya û bêdil xuya dike.
Li gel ku aliyê Kurdistanî di pêşengiya Rêber APO de, li gorî çarçova pêvajoyê bêkêmayî, belê bi tevayî barê ku bû para wan hildan ser milên xwe, bê dudilî û bê xemsarî, bi berpirsiyarî û dîsîplînî peywirên xwe cêbecê kirin û hîn jî bênavber didomînin, lê belê aliyên dewleta Tirkiyeyê, ji berpirsiyarîyên xwe gelek dûr dimeşin.
Hema di serî de, li gorî exlaqî û yasayên navneteweyî jî, ji bo ku ew û aliyê li himber, wekhev bibin xwediyê mafan, diviya Rêber APO ji zûve hatiba azadkirin.
Li pey vê gavê, diviya yasayên mîna QEYÛMAN, ji meriyetê hatiban rakirin, bi hezaran girtiyên siyasî ji zîndanan hatiban berdan, êrîşên li ser Rojava, Başûr û hemû Kurdistanê hatiban rawestandin û hwd.
Lê na herê, hema mînaka Hakan Fidan bi tinê wê siyaseta wan a qirêj û xapînok dide der, ku mîna koordinatorê dewletên dagirker Suriyeyê, Iraqê, Îranê û hwd. dixebite!
Lê dîsa jî divê, aliyên Kurdistanî hêviya xwe neşkînin û li gel Rêberê xwe, bi bawerî û biryardariyek mezin, meşa xwe ya kominalîzmê bidomînin!



# Foza Yûsif: Dewleta Tirk bi komployê dixwaze tifaqa stratejîk ya gelan têk bibe

Endama Konseya Hevserokatiya PYD'ê Foza Yûsif diyarkir ku dewleta tirk ji bo ku aramiya heremê têk bibe, da ku Sûriyeke navendî ava bike û bi rêya medya dîjîtal şerekê taybet û derûnî li ser heremê dide meşandin.

**Tekoşîn Amara/ Qamişlo**

Piştî Konferansa yekhelwesta pêkhateyan ê ku di 8'ê Tebaxê de li bajarê Hesekê hat lidarxistin, dewleta Tirk ji bo ku di Bakûr û Rojhilatê Sûriyê de parçebûnê bide avakirin bi rêya çapemeniyê, bi zimanekê qirêj û tund êrîş dike. Di derbarê Rewşa heyî de Endama Konseya Hevserokatiya PYD'ê Foza Yûsif bersiva pirsên Rojnameya me da û hevpeyvîn wiha ye.

**Tevî pêvajoya aşitî û civaka demokratîk, lê hîn dewleta Tirk dijminatî û dijbertiya xwe li hemberî Bakûr û Rojhilatê Suriyê didomîne. Bi taybet piştê konferansa yek helwesta pêkhateyan ku hat lidarxistin gef û êrîşên xwe li ser heremê zêde kir, li gorî dîtinên we sedemên vê yekê çine?**

Sedema gefên rayederên Tirkiyê ku di demên dawiyê de pêş dikevin, naxwazin ku sîstemeke demokratîk û pirrengî di sûriyê de pêşbikeve, daxwaza wan Sûriyeke navendî ye. Ev jî dide diyarkirin ku di çareserkirina pirsgirêkan de hê jî bi hişmendî û rêbazên kevin dixwazin bikarbînin, armanca wan ji vê yekê ew e, ku em ji daxwazên xwe gav paşde bavêjin. Piştî civîna di navbera şandeya Bakûr û Rojhilatê Sûriyê û hikûmeta veguhêz ya Şamê de hat lidarxistin. Daxuyaniyên rayedarên Tirk zêdetir derketin berçav. Hewildanên wan ew e, bê ku em parastina maf û destkeftiyên xwe bikin dev ji destkeftiyên xwe berdin."

**Dewleta Tirk ji bo ku destkeftiyên heyî têk bibe û Rêveberiya xweser di heremê de lawaz bike, bi hemû hêza xwe ketiye nav liv û tevgerê; taybet bi rêya medya dîjîtal reşkirinê dike. Hûn vê çawa dinirxînin.?**

Raste! Îro bi rêya medya dîjîtal şerekê taybet û derûnî di asta herê jor de li ser heremên me tên meşandin. Armanca jê ewe ku hin bêhtir aramiya heremê têk bibe û fitnê di navbera gelan de bide çêkirin, herwiha baweriya gelê heremê ya li hemberê Rêveberiya Xweser û QSD'ê lawaz bike. Tevlîheviya ku di heremên Sûriyê de heyî derbasê qada Rêveberiya Xweser bike, wê jî wek hinceta destwerdanê bi kar tîne. Ev jî şerekê pir xetere, armancên wê gelekî xirabin, ew nêzîkatî û helwest xizmeta axa sûriyê û aramiya Sûriyê nake. Berûvajî vê yekê rê li sorkirinê vedike, armanca wan ya bingehîn derxistina şerekê navxweyî di nav pêkhateyên heremê de ye.

**Piştê hevdîtinên Tirkiyê bi hikûmeta vegûhêz re, bi rêya çapemeniyê dixwazin Eşîr û pêkhatetan li dijî Rêveberiya xweser sor bikin, hûn vê pilanên wan çawa dinirxînin?**

Yek ji sedemên şerê taybet ew e, ku di navbera pêkhateyên kurd û Ereb de aramiya heyî têkbibin û şerekê navxweyî derbixîne. Heger tişteke wiha bibe wê encamên wê gelek giranbin, ji ber ku rêjeyek Eşîrên Ereban di nav Rêveberiya xweser, QSD'ê û Asayîşê de cîh digrin. Angu di rewşek wiha de wê di nav pêkhateyên Ereb bi xwe de jî parçebûn û aloziyekî pir mezin derbikeve, eşîr bi xwe jî wê bibin du parç e. Dewleta Tirk dixwaze ku bi destê eşîran kompoyekî li ser heremê pêkbîne. Rûspî û endamên eşîran di ferqa kompoyên ku tên meşandin de ne, erkê herkesekê ye ku bi hişyarî û berpirsiyariyeke mezin vê komployê vala derxîne. Herwiha pêwîste ku herkes di ferqa van leyîstokên ku li ser heremê têne meşandin de be û bi wê ferasetê jî nêz bibe. Tiştên ku li Siwêda diqewimin bi heman senaryoyê li Bakûr û Rojhilatê sûriyê jî dixwazin pêkbînin, dema ku ev yek bibe wê encamên giran ji bo tevahiya Sûriyê bixwere bîne û wê bibe sersebebê ku şerekî navxweyî li tevahiya Sûriyê rûbide.

**Li hember van êrîşên ku dixwazin di nava pêkhateyan de şerekê navxweyî derxin holê, di serî de erkên ku dikevin ser milê Rêveberiya Xweser û hemû pêkhateyan çine?**

Erkên gelek mezin û dîrokê dikeve ser milê tevahî pêkhate û partiyên siyasî, saziyên civaka sivîl, rûspiyên eşîran û Rêveberiya xweser. Pêwîste em gel û civaka xwe hişyar bikin ku nekevin nav leystokên qirêj de, ger şerek derkeve jî wê kes serkeftî dernekeve, şer wê rê li pêşiya keraseteke civakî veke û parçebûyîneke mezin bi xwe re bîne. Biratiya gelan ya ku bi saya xwîna şehîdan hatiye avakirin, bi vî şerî wê ev destkeftî û hevgirtina gelan ji holê rabe û wê alûziyên demdirêj bi xwe re bîne.






Rejîma Baas bi salan hewil da ku di heremê de fitnê û parçebûnê di nava gelan de derxîne holê, lê nekarî vê yekê pêkbîne; bi saya xwîna şehîdan, kar û xebatên rêveberiya xweser hevgirtina eşîran pêkhat û hemû hewildanên ku dixwazin parçebûnê bikin valederxistin. Rêveberiyên êşîran ketin wê ferqê ku zirareke çawa wê bixwere bîne dema ku şerê navxweyî biqewime, encama ku ji Siwêda derket jî li ber çave ye, tu kesî ji wî şerê ku rûdayî sûd negirt, berûvajî her ku çû rewşa heyî alûztir bû û bandora xwe li tevahiya sûriyê kir.

Pêwîste rewşenbîr bi rêya ragihandinê, civîn, nîqaş û medya dijîtalî hişyariyan pêş bixin. Civak û tevahiya pêkhateyan geleke bizanibin ku ev yek wê dawiya tevahî gelê Sûriyê bi xwere bîne û wê Sûriyê tevahî parçe bike. Herwiha pêwîste partiyên li Bakûr û Rojhilatê Sûriyê xwedan helwest bin û li hemberî kesên ku dibin amûr ji bona ku civakê ji hev parçe bikin û şerê navxweyî derxînin holê hişyar û xwedî helwestbin.

Bêguman pêwîste Rêveberiya xweser jî bi meclis, komîn û hemû pêkhateyên xwe jî bikeve nav liv û tevgerê de û bi riya civîn û komxebatan gel di vê derbarê de hişyar bike, xeterî û hesasiyeta rewşa heyî raxîne ber çavan. Ger em yekîtiya xwe ya hundirîn bi hêz bikin wê tevahî komplo û planên heyî vale derkevin. Di demên dawiyê de me bi hemû pêkhateyên xwe ve li hemberê DAIŞ û dagirkeriyê têkoşîneke bêhempa da meşandin. Di serî de dewleta tirk û çeteyên pêve girêdayî dixwazin tifaqa stratejîk ya ku di nava gelan de pêşketiye têk bibin. Lê li hemberî van hemû planan emê hevgirtin û yekîtiya xwe biparêzin, aramî û aşîtiya civakî pêkbînin.

## FENER



## Keleşêr Be û Li Ser Çîmenê Xwe Biqîre!

**Idrîs Henan**

Carinan koma statîk a hinek peyvên veguhêz, çi mecazî û çi rasterast bin, nikarin bi awayê sîstematîk wateya tiştekê yan jî buyeran biguherîne. Lê dibe li hinek herêmên bi sînor bi wate û hêza guhertina mezin bin. Lewre, her buyer û qewimîn li heman cih û zemanî wek hev nayên analîzkirin. Lê eger nêrîn dîrokî be, dibe wate were ravekirin û ders jê were derxistin. Ji ber vê jî biwêj û gotinên pêşiyan ên fena (Her Keleşêrek Li Ser Çîmena Xwe Diqîre), rastiyek civakî û siyasî ya kûr temsîl dike. Di vê biwêjê de "Keleşêr" nûnerê hêzê û hegemoniyê ye, aliyê din "Çîmen" jî temsîla jîngeh, sînorên cografîk, civakî û dîrokî yên naskirî yên serdestiya Keleşêr in. Ji xwe jî Qîrîn temsîla dengê siyaset, slogan û dengê heqîqetê ye.
Dema ku gelek têkoşîn û meşa xwe ya ber bi azadiyê ve bi amûrên biyanî bi rê ve bibe û dîlê rêbazên kirêkirî yên dûrî rastiya xwe ya dîrokî û civakî ne, dê nikaribe daxwazên xwe rewa bike û tam berovajî wê armancê, dê têkoşîna azadiyê, bi mentiqê Keleşêrê li ser serguyê xelkê qîr dike, veguhere kaosekê ku belayên mezin bi xwe re bîne ser civakê. Ango rewabûn lawaz dibe û wateya polîtîk exalq ji nav diçe ku ne li ser kokên resen şîn hatiye.
Di rewşeke wisa de xîtabên qebe tenê dibin "Qîrîn" ku nikarin di vê jîngeha biyanî de veguhere çalakiya bi bandor. Ev yek jî dê bibe sersebebê têkçûna hemû projeyan ku dûrî rastiya xwe ya dîrokî û civakî ne, di heman demê de têkîliya bi mîratê re jî qut dibe û resentî red dibe. Di encamê de valatiyek siyasî û civakî diafire ku bi awayekî sîstematîk, bê wate, xwe dubare dike. Ev jî fena kesê dixwaze kûpa avê ya kun tije bike ye. Ew jî kirinek bê mane ya dûrî heqîqeta avabûnê ye.
Di cewherê têkoşîn û xebata ber bi azadiyê ve ya ku pala xwe daye berjewendî û ecindeyên biyanî yên derveyî jîngeha neteweyî ya bê kok, herikandina vala ya enerjiya hundirîn heye. Êdî şiyanên xweser dibin mexdûrê berjewendiya biyanî ku ti carî bi rastiya civaka heyî re nabin yek. Ji ber vê jî, ti rastî û wateya wê herikandinê namîne. Eger bê niyet be, otokolekirin e. Eger bi zanebûn be jî, di jiyana koletiya xwefiroş de israrkirin e. Ji bo parastina çalakiya herikînê û bidestxistina nasnameya xweser, divê mîrata dîrokî, siyasî û civakî baş were fêmkirin û rast were vegotin. Bi xwe înkarkirinê guncaw nabe. Azadî ne caweke ku mirov ji derve bikire. Teyisandina vîna gelekî xwedî şopa dîrokî ya mezin e.
Li gorî vê zanebûna ku pala xwe daye binesaziyek xweser a çandî û civakî, çi projeyên siyasî yên biyanî hebin, nikarin bibin xwedî şansê jiyanê û ne jî dikarin guhertin û veguhertinê bi xwe re bînin. Angu nikarin li ber îradeya neteweyî ya gelekî xwedî azweriya azadî û rizgariyê, li ber xwe bidin û aqûbeta wan têkçûna mezin a sosret e. Ji bona gelekî; semaya li ber rîtmên keleşêrekî li ser çêrekên xelkê qîr dike, otoradestkirin e. Di heman demê de rêzezincîreke komên statîkên ê nesaz e. Ne mecaz û ne jî rasterast wate lê bar dibe. Di heman manê de jî, kirinek nepevhatî ya mantelîteya ku nayê analîzkirin e.